Eyub

Jîana Eyubî

Zelamek li erdê 'Us dijîya, navê wî Eyub bî. Ew zelamekê baş u bê kêmatî bî. U ji Xwidê ditirsa. U xu ji xirabîê dida rexekê. U Eyubî ḧeft kurr u sê kiç radan. U hijmara kelupelê wî gehişte ḧeft hizar sera ji miha u sê hizar ji ḧêştira, u pênc sed cutêt çêla u pênc sed kera. Belê xizmet karêt wî gelek bîn. U ev zelame ji hemî zelamêt rojhelatê meztir bî. U kurrêt wî fêr bîn ku xwarnêt ber fireh li malêt xudan in u daxwaza her sê xoşkêt xu dikirin daku bişkdarîê têda bikin. U demê rojêt daxwazkirna xwarnê bi dumahî dihatin, Eyubî gazî dikire kurrêt xu, u ew pîruz dikirin u hêşta spêdê zî radibî. U li dîv hijmara wan ewî gurîêt sutinê pêşkêş dikirin u digut, "Ne weku kurrêt min gunneh diderheqa Xwidê da kirîn u gutinêt ne baş gutbine Xwidê u Eyub li ser vê çendê berdewam bî.

Xwidê destîrê didite Iblîsî Eyubî ditaqî bikit

U rojekê Iblisî li def Xudanî amade bî. Îna Xudanî pisîara Iblisî kir, "Tu ji kîve diêî?" Îna Iblîsî bersiv da, "Ji gerrîana erdî u ez dinav da gerram." Îna Xudanî gute Iblîsî, "Erê tu berê xu da kuîlê min Eyubî? Kes weku wî li erdê nîne – ew zelamekî bê kêmatî ye – u ji Xwidê ditirrsit u xu ji xirabîê dite rexekê." Îna Iblîsî bersiv da, "Erê, ma bi her we Eyub ji Xwidê ditirrsit? Mane te li durêt wî u li durêt mala wî u heçîê hey tekutan kirîe? Te hemî karêt wî yêt pîruz kirîn. U te erd ji kelupelêt wî tijî kirin. Belê heker tu jê bistînî, dê di rîê te da civîna dite te." Îna Xudanî gute Iblîsî, "Eve ez dê heçîê hey deme destê te u li jêr desthelatî ya te, belê destê xu drêj ne ke yê daku jîanê bigehînî yê."

U rojekê kurrêt Eyubî u kiçêt wî li mala birayê xu yê mezin dixwarin u mey vedixwarin. Êk hat def Eyubî u gutê, "Demê çêla kêlan dikir u dewar bi rex wan ve diçerîn, hêriş kerêt Sebeîya bi ser me da girtin. U talan kirin u bi devê şîrî xulam kuştin. U ez bi tinê qurtal bîm daku bêm nuke bigehînim te." U demê ew diaxift, êkê dî hat u gut, "Baruvek ji esmana hate xwarê u pez u xulam hemî sutin u xwarin. U ez bi tinê qurtal bîm da nuke bigehînim te." Demê wî diaxift, yê sîê hat u gut, "Sê tîp ji Kildanîya hêriş înane ser me, u ḧêştir talan kirin xulam bi devê şîrî kuştin. U ez bi tinê qurtal bîm da nuke bigehînim te." U hêşta evî diaxift yê çarê hat u gut, "Kurrêt te u kiçêt te dixwarin u mey vedixwarin li mala birayê xu yê mezin. Bayekê dijwar ji ber yê hat, u her çar kujîêt xanî êxistin u kete ser wan u hemî mirin u ez bi tinê qurtal bîm da bêm nuke bigehînim te." Îna Eyub rabî u cukîê xu dirrand. U pirça serê xu birrî u xu çav çavkî havête erdî u Xwidê perist u gut, "Ez rîz ji zikê deyka xu derketim, u dê rîz vegerrîm wêra henê, Xudanî da u bir, u bila navê Xudanî pîruz bit." Li vê hemîê Eyub diderheqa Xwidê da xelet ne bî u çi karêt helhelî ne kirin.

Taqîkirna Eyubî ya dûê

U careka dî Iblîsî li def Xudanî bi rêzgirtin amade bî. Îna Xudanî gute Iblîsî, "Erê, te berê xu da kuîlê min Eyubî? Ew zelamekî baş e u bê kêmatî ye. U kes weku wî nîne. U ji Xwidê ditirrsit u xu ji xirabîê didite rexekê u heta vê gavê yê li ser wî bê kêmatîê ye. U her çende te ez li wî xirjandim daku bibê eger wêran bikim." Îna Iblîsî bersiv da, "Pîst bi pîstî! Hindî miruve heçîê hey didit daku gurî xu bikit, belê demê tu dest dikî ye hestî u goştê wî, ew hîngê dê drîê te da civîna dite te." Îna Xudanî gute Iblîsî, "Eve ez dê dime destê te, belê deruna wî biparêze."

Eyub Tuşî Kulka dibit

Îna Iblîs ji def Xudanî çû, u Eyub tuşî kulka kir u hemî leşê wî vegirt – her ji gupîtka serê wî u heta binê pêt wî têkda bîne kulk. Îna Eyub di nîva xulîê da rînişt u dest havête qafkekê u kulkêt xu pê xurandin. Îna jina wî gutê, "Erê heta vê gavê tu li ser bê kêmatî ya xu maî? Civîna bike Xwidê u bimire." Îna bersiva wê da, "Tu weku miruvêt nezan diaxivî. Ma dê bi xêrê ji def Xwidê qayîl bîn u bi xirabîê qayîl nabîn?" U devê hemîê da, lêvêt Eyubî çi xeletî diderheqa Xwidê da ne gutin.

- Pirtuka Eyubî 1:1-2:1, 2:3-10

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.